KESKESOR

Îsmayîl Silêman Hacanî

Demê cara yekê çavên min bi asmanî ketî, zarok bûm li ber milê dayika xwe. Ji hîngê ve min hez ji rengê asmanî u bilindayiyê kir û bi tenê asman bo xwe bi sînor zanî. Çaxê fama bûm û li gel hevalan çûme yariya û behsê çûçikan û hêlînan hatiye kirin, li gel wan çûme aqarî. Gava girek yan zorek ketiba asoyên çavên min, bi lez û bez bi ser diketim çimkî min nedixwest çi sînor li pêşiya min hebin ji bilî asmanî. Demê cara yekê çûme ser ava mezin rûbarê Dîcleyê har û dîn wekî marekî ejderha dileziya û zevî dubir dikir. Min hez dikir ku ev sînoreke li pêşiya min û divê vî sînorê jî bibezînim. Her wê rojê min xwe fêrî melevaniyê kir. Her roj, ji mal direvîm û li gel zarokên ji xwe mezintir diçûme ser ava mezin û diketime baska de. Layê dî yê rûbarî werzên zebeşan hebûn. Ewên ji min mezintir diçûn layê din û şemamok dihînan. Min hest bi dilgiraniyê dikir. Carekê ez jî li pey wan çûm heta nîva avê û çengên min şikestin, ew ma bû bixeniqim lê bextê min sipî bû hindek gamêşên ereban nêzîkî min bûn. Min xwe bi kuriya gamêşê vegirt heta bêhna min hatî û careka dî ketime avjeniyê û derbazî layê dî bûm û li xwe zivirîm temaşayî pêlê avê kir û hest bi dilxweşiyeka mezin kir ku ev sînore jî bezand.

Wê roja han ji dergehê Birahîm Xelîl derbazî layê dî bûm min hest bi hebûna çi sînoran nekir bi tenê ew jora di rê de hindek kesên ne dêmê wan û ne zimanê wan weku dêm û zimanên min bûn deşta Silopî ya çûçek difirîn û avazûn kurdî dixwendin, guliyên pembû yê spî li ber bayê spêdê semayeka kurdî dikir. Li ser pira Cizîrê Mem û Zîn ê piyase dikir, Cizîrî û selwa di nav baxên îrem de

rûnişтî bûn. Di roya Nisêbîn ê de hin stûngên bejinkurt û pir dirî û sîmrêz bû.

Qamîşlo û Nisêbîn ê hevûdû hembêz kiribû zaroyekê topanê dikir, topa wî derbazî xetê bû, girî ku bê tope zivirî mal. Gora miriyekê di rê de bû, kêliyeka wî li ser xetê bû ya din di bin xetê de ye dayikekê û Nisêbîn ê lorîk digot. Zarokê wê li Qamîşlo dixdix dikir. Hind pîrekan li ser xetê pembû diçinî û stiran digotin hindek pîrekan li bin xetê lê vedigerand. Çend tirimbêl li zeviya cade hin zirav dibû, car car li xwe dizivirî ew stun di navbera Qamîşlo û Nisibînê bû hindek bêtir bejinkurt dibûn heta geheştine bilindayiya Mêrdînê. Li xwe zivirîn ew stun û sîn û dirî berze bibûn deşta Silopî ya û deşta Bubanê û deşta Mêra û Hesina li gel deşta Dêrik û Dêrika Çiyayê Mazî û Çemê Kersê li bedena çiyayê Şingal ê hev hembêz kiribûn bibûne yek parçe.

Min destmala xwe bilind kire çavên xwe gotina çend!!! Çi sînor.

Pexşan

PEYV



Evîn Mihemed Baleteyî

Ya berze bû li pişt çiya. Birîndarbû di nav zinarên bera. Bi (êkitiyê)(hevgirtinê) xwe rizgar kir. Bi (ixtiyariyê)bi ser çiyayî keft. Bi qurbaniyê xwe bi ronahiyê heyvê girt ta ku bo cîhanê rûbite . Û bi ava robarê azadiyê şîn bibe. Kurdistan, omêda duhî, solîna evro, nêrgiza paşerojê.

Êkitî, hevgirtin, îxtiyarî, qurbanî, azadî û peyvên welatîne. Kurdistan, omîd, solîn, nêrgiz, peyvên erdîne û bi lêva hatîne gotin. Bi kakilka dilî hatîne nexşandin ta ku bi qelemê nejiyê bêne bîrhatin li hemû deman.